

Duwem salvegera koçkirin Serokê Partiya me birêz Ismâil Umer

Îro, roja Pêncşembê 18.10.2012an, li ser daxwaza Rêxistina Cizîrê ya partiya me, Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê-YEKÎTÎ- bi sedan heval, hogir û dostên Partiyê digel beşdariya hin rêxistinên Kurd ên bira, bi gul, kulîlk û çîçekan li ser gora nemir, mamoste Ismaîl Umer li gundê Qereqoyê civiyan. Birêz Eliyê Remî xêrhatina beşdarî kir û bêhnêk bêdeng li ser giyana xebatkare gelê me û rewanê hemî pakrewanên Kurd û Kurdistanê û yên şoreşa Sûriyê rawestiyên. Birêz Zerdeşt Mihemed-endamê komîta rêzanî ya partiya me, bi zimanê Kurdî gotinek pêşkêşî beşdarî kir. Deqa gotinê ev bû:



"..Îro, em hemû bi hev re li vir kom bûne ,da ku em mamoste Ismaîl Umer û hemû pakrewanên şoreşa azadî û rûmetê li Sûriyê bi bîra xwe bînin...Ez dixwazim bêjim ,ku mamoste Ismaîl Umer ne tenê serokê partiya me bû û hew, lê belê, ew bi nernî û bîr û baweriyên xwe pirojeyê siyasî bû. Çûna wî ya lezgîn, ne tenê ji bo me, lê belê ji bo tevgera me Kurdî û niştimanî bi tevayî zirareke mezin bû....Armanca serke ya wî û partiya wî, yekrêziya tevgera netewî ya Kurdî li Sûriyê bû. Ji ber ku, ew xwediyê wê baweriyê bû, ku bi vê rewşa perçebûna tevgerê, em nikarin rola xwe bilîzin û ji doza gelê xwe re bibin nûner. Bo wê baweriyê jî, herdem ji bo avakirina

lêvegerek Kurdî xebat kiriye.

Îro, di vê bîranîna dilêş de, em dikarin mizgîniya pêkanîna armanca wî ji giyanê wî yê pîroz re bişînin û bibêjin, li ser wê riya ku te canê xwe di ber de fîda kiriye û kula wê bi te re çûye gorê, me gavine berfireh li ser avêtine, bi hêvî ne ku hê pêşdetir herin..."

Piştî wê, Jîna Remî, helbesteke şêrîn bi zimanê erebî j beşdarî re pêkêş kir. Paşê, mamoste Şerîfê Binxet gotina Encûmena niştimanî ya Kurd li Dirbasîy xwend û mamoste Dilawerê Zengî gotina Dezgeh Ismaîlê Emo ya Çand û Civaka Kurdî bi zimanê dayik xwend û ev e deqa wê ye:

Beşdarên hêja û delal

Malbata nemir ya rêzdar

Endamên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê .

Berî du salan, di rojê wek roja îro de, me peyakîkî gewre, xebatkarekî hêja, siyasetvanekî zîrek me ji nav xwe wenda kir. Ew xebatkare me nemir bavê Şiyar bû. Bavê Şiyar dora pêncî salî - ji ji gelê xwe yê Kurd re xebitî ye. Bê cangiranî û bê rawestandî tim li rêz û benda eniya pêşî bû. Berketiyê yekîtiya tevgera kurdî bû. Xwediyê ramana azad û karê baş bû. Mirovekî rastgo û bi bawer bû. Hevalê hevalê xwe bû. Ne keysebaz û pergîr bû. Xebatkarekî dilsoz bû.

Bêguman, koçkirina nemir di van rojên pir teng û dijwar de ,cihê dilxemgîniyê ye. Di vê dema ku em j her demê pirtir hewcedarê wî bûn. Lê mexabin, dest l ber mirinê nayê hildan, pir zû ji nav me bar kir.

Em bi navê dezgeha nemir Ismaîlê Emo ya çand û civaka kurdî sersaxiya miletê Kurd, malbata wî û heval û dostên wî dikin. Xwedê wî bi mihderî û dilovaniya xwe şake û cihê wî buhişt be.

Dezgeha Ismaîlê Emo ya çand û civaka kurdî

Elmaniya 18-10-2012

Hêjayî gotinê ye, ku gelek alavên ragihandinê, berpîrsên malperan û kenalên ezmanî beşdarî ahengê bûn û hevpeyvîn bi hin dost û hevalan re çê kirin.